

# Xwendina sfi ya zimanê swêdî ji bo biyaniyan

Xwendina zimanê swêdî ji bo biyaniyan (sfi) ji bo te ye yê ku zanîna bingehî ya zimanê swêdî jê re pêwîst e. Tu dê ew qas xwe fêrî zimanê swêdî bikî ku tu bikarî devkî û nivîskî danûstandinê di jiyana rojane de, di jiyana civakî de û di jiyana karî de bikî. Heger tu bi yekcarî nikarî bixwînî yan binivîsî, îmkân dê ji bo te hebe ku tu xwe fêrî bikî.

## Tiştên ku tu dê di sfi-yê de fêrî bibî

- zimanê swêdî bixwînî û binivîsî
- di minasebetên cuda de bi zimanê swêdî biaxivî, suhbetê bikî, bixwînî, guhdariyê bikî û fehmî bikî
- dangan bi lêvî bikî
- alavên alîkariyê yên eleqedar bi kar bînin
- zimanî li gor wergir û rewşên cuda biguncînin
- ka mirov çawa fêrî zimanî dibê
- stratejiyên/rêyên danûstandinê bibî

## Sfi belaş e

Xwendina di çarçoveya sfi-yê de bêpere ye. Kitêb û alavên din yên fêrî bûnê jî tê de ne. Mesrefeka hindik dikare hebe. Gava tu di çarçoveya sfi-yê de dixwînî, tu nikarî piştgiriya maddî ya ji bo xwendinê ji Komîsyona Navendî ya Piştgiriya Xwendinê (CSNê) werbigirî.

## Rêberiya xwendinê û pîşeyê

Rêberiya xwendinê û pîşeyê dê ji bo te wek şagird berdest be. Tu dê agahdariyan li ser xwendinê û ka bazara karî çawa ye werbigirî.

## Tu dixwazî zêdetir bizanî?

Pêwendiya bi belediyeyê xwe bike heger tu dixwazî dest bi sfi-yê bikî. Agahdariyên pêwendiyê di malpera belediyeyê de hene.



## Kî dikare li sfi-yê bixwîne

Tu dikarî ji 1-yê tîrmeha wê salê ya ku tu tê de dibî 16-salî dest bi sfi-yê bikî. Ji bo destpêkirina xwendinê, sinor ji bo temenê mezintir tune ye. Divê tu nişteciyê Swêdê bî û zanîna bingehî ya zimanê swêdî ya ku xwendin pêşkêş dike li ba tune be.

## Xwendin weha hatiye rêxistin

Zanîn û tecrîbeyên biqîmet bi te re hene û ji lewre giring e ku ew di xwendinê de bî hîmbêz kirin. Xwendin bi te re tê plan kirin û rêxistin û li gor hezkirin, tecrîbe, zanîn û armancên te tê guncandin.

Her kes bi leza cuda kursan dixwîne çunkî sfi ji bo kesên xwedî tecrîbe, rewşên jiyandê, zanîn û armancên xwendinê yê cuda ye. Ji lewre kurs ji bo kesên cuda di demên cuda de tê dest pê kirin û qedandin.

Mafê te heye ku tu bi navencî di peryodeka çarhefteyî de di hefteyê de 15 saetan dersan bistînî. Dema dersadanê dikare bê kêr kirin heger ji bo te baştir bi rê ve biçê.

Tu dikarî sfi bi kar, pratîk/tebîq yan xwendineka din, bo nimûne lîse, xwendina salmezînan ya belediyeyê (komvux - komvuks) û xwendina taybetî ya salmezînan (sârvux - sêrvuks)ê ve girê bidî.

Îmkan heye ku tu tevahiya yan beşekê kursekê li cihê karî bixwînî. Ji wê re fêrbûna li cihê karî (apl) tê gotin. Ew yek ji gelek rêyên din e ji bo wergirtina zanîna zimanê swêdî ya ku ji bo tevlîbûna jiyana karî pêwîst e.

## Rêyên xwendinê û kurs

Sê rêyên xwendinê yê sfi-yê hene: 1, 2 û 3. Rêya xwendinê ya 1ê ji wî kesî re ye yê ku nikare bixwîne û binivîse yan ji bo demekê gelek kurt çûbe mektebê lê rêya xwendinê ya 3ê ji wî kesî re ye yê ku zêdetir hînî xwendinê bûye. Her rêyekê xwendinê ji kursên A, B, C û D-yan pêk tê.

- Rêya xwendinê 1: kursên A, B, C û D.
- Rêya xwendinê 2: kursên B, C û D.
- Rêya xwendinê 3: kursên C och D.

Heger tu bixwazî tu dikarî paş her rêyeka xwendinê û kursekê xwendina xwe biqedînî. Te ji kîjan sewîyeyê dest pê kiribe, îmkan ji te re dibe ku tu heta kursa D-yê bixwînî.

## Plana xwendinê ya ferdî

Wek şagird, planeka xwendinê ya ferdî ya te dê hebe. Xwendingeh bi te re plana xwendinê ya ferdî amade dike. Ji tiştên ku tê de hene:

- armancên xwendina te û
- çarçoveya xwendina te.

Plana xwendinê ya ferdî dikar bihê guherîn heger tu di dema xwendina xwe de bixwazî kursên zêdetir bixwînî yan armanca xwendina xwe biguherînî.

## Not/derece

Sfi heman pîvana notan/dereceyan A–F ya, bo nimûne, li dibistana destpêkê, lîseyê û komvuxê (komvuksê) bi kar tîne. A nota/dereceya bilindtirîn e û F neqebûlkirî ye. Not/Derece ji bo beşê teslîmkirina erkên xwendin û nivîsnê nayên dan.

Not ji bo her kurseka qedandî tê dan. Tu dikarî jî belgeyekê ya ku tê de zanîna te dokumentkirî ye bistînî.

## Îmtihan – weha dibe

Îmkan heye ku tu îmtihanê di kursekê de bidî heger tu nişteciyê welatî bî û dixwazî notan/dereceyan li ser kursê bistînî. Ev tê wê maneyê ku zanîna te li

gor plana kursê tê nirxandin. Mafê te heye ku tu îmtihanê di hemû kursan de yê ku jê re not/derece tên dan bidî. Divê îmtihan tenê li wê belediyeyê bihê kirin ya ku kursa eleqedar amade dike.

Mafê xwendingehê heye ku heqekê îmtihanê bistîne heger te ji berê de noteka/dereceyeka qebûlkirî di wê kursê de hebe. Heq dikare herî zêde 500 kron be.

## Hilsengandin - bila zanîna te ya berê bê nirxandin

Îmkan ji bo te heye ku zanîna te ya berê bê nirxandin û dokument kirin. Armanc ji hilsengandinê dikare ew be ku tu dixwazî:

- dest bi xwendinê bikî û ji bo destpêkirinê naverok û sewiyeya xwendina xwe weha biguncînî ku êdî pêwîst neke tu wê ya ku tu ji berê de dizanî cardî bixwînî
- dema xwendina ku berdewam e kurt bikî, yan

- zanîna xwe dokument bikî ji bo bikarî di, bo nimûne, hevdîtina karî de nîşan bidî.

Pêwendiyê bi belediyeya xwe bike heger tu bixwazî hilsengandinê bikî.

## Sfi li xwendingeha bilind ya gelî

Îmkan ji bo te heye jî ku tu bixwazî li şûna sfi-ya belediyeyê sfi-yê li xwendingeha bilind ya gelî bixwînî çunkî ev xwendin li xwendingehên bilind yên gelî jî tê dan. Ji belediyeya xwe bipirse ka çî îmkan hene heger tu dixwazî sfi-yê li xwendingeha bilind ya gelî bixwînî.

